

Mafên te li Dibistana Folk'ê [Folkhögskola]

Mafên xwendekar – Ji bo te û Dibistana Folk'ê girîng e

Dibistana Folk'ê şekleke perwerdehiyê ye ku bihin armanca weke bihêzkirina beşdarî, sozdarî û pêşketina demokratîk a civakê tê birêvebirin. Çalakiyên wan ji aliyê dibistanan bi xwe va hatiye plandarêştin. Dibistanên Folk'ê ji qanûna perwerdehiyê hatine vawêrtin û tu pêwîstiyêke bernameya dersa neçarî ya parêzgehî di wan da tune. Konseya Perwerdehiya Folk'ê berpirsa belavkirina mûçeya dewletî ye ku dibistan ji bo piştevaniya ji xebatên xwe werdigirin. Dibistan her wiha divê şert û mercên alîkariya Konseya Perwerdehiya Folk'ê ku tekezî li ser mafên xwendekaran dike, bişopînin.

Wek beşdarekî di pêvajoya qanûna xwendekarên dibistanê, pêwîst e ku şiyana te ya xwendina rêzikên dibistanê derbarê babetên mafdarî yê xwendekaran, weke birêvebirina giliyan, kiryarên înzibatî û bandora beşdaran hebe. Li Dibistaneke Folk'ê, lijneya rêveberiyê desthilata herî bilind ji bo dibistanê û perwerdehiyê ye. Wateya vê yekê ev e ku pirraniya biryarên ku bandorê li ser rewşa te û mafên te li dibistanê dikin, ji aliyê lijneya rêveber a dibistanê va tên dayîn.

FSR Konseya Qanûnî ya Xwendekarên Dibistana Folk'ê ye û armanca wê bihêzkirina mewqîya qanûnî ya gişt xwendekarên Dibistana Folk'ê ye. Tu dikarî li xwarê derbarê şewaza xebata FSR'yê û eva ku em wek beşdarek dikarin çawa li wir alîkariya te bikin, zêdetir bixwîn.

Gelo tu nerazî yî? Gelo di pevçûnekê da yî? Divê çi bikî?

Gelo tu ji rewşa xwe ya niha nerazî yî an navbera te û dibistanê nakokî hebûye? Pêngava yekem ev e ku serdana rêveberê dibistanê bikî. Eger bersiva rêveberê dibistanê te razî neke, tu dikarî giliyekê li cem lijneya dibistanê vekî. Piştî ku wan helwêsta xwe li ser vê mijarê hilêxist, eger hîn jî nerazî bî, dikarî li cem FSR'yê gilî bikî. Bila li bîra te hebe ku hemî rapor û peyamên wergirtî ji aliyê FSR'yê va dibin belgenameyên gelemperî. Ji ber vê yekê, dibe ku ew li gorî prensîba berdestbûna gelemperî ya zanyariyan bèn eşkerekirin.

Tu dikarî çî pirsan ragihînî?

Tu dikarî pirsên xwarê ji FSR'yê bikî:

- kûrsên we kurttir in ji ya ku dibistanê reklama wan kiriye
- vekolandina giliyan ji aliyê dibistanê va
- rûbirûbûna dibistanê di gel kiryarên înzibatî, weke hişyarîdan, rawestandî û derxistinê
- nebûna zanyariyan li ser xercan
- têrênkirina rêberîkirina xwendinê
- nebûna şopandina bernameya xwendinê
- nebûna têkiliyê di warê encamên lêkolînê da
- rêvebirina dibistanê di dema qutbûn an betalkirina kûrsê da
- nebûna beşdarî û bandora wê li ser mafên xwendekar

Derfeta venihêrîna li ser nirxandina lêkolînê li FSR'yê an her saziyeke din a derveyî tune.

Tu tenê di rewşekê da dikarî pirsgirêkan ji FSR'yê ra ragihînî ku beşdarî kûrekê bûbayî ku heyama wê zêdetir ji 15 rojan be. Navnivîsandin divê salekê piştî derçûna xwendekar ji aliyê FSR'yê va hatibe wergirtin.

Piştî tomarkirina raporekê dê çî biqewime?

Lijneya Dibistana Folk'ê berpirsa çalakiyên dibistanê ye û qayîde û rêzikên têkildar diyar dike. Di dema nirxandina babetekê da, FSR li gorî rêzik û şert û mercên Dibistana Folk'ê bi xwe ye.

FSR bi ti awayî nikare biryara dibistanê biguherîne; tevî vêya, em hin pêşniyazan raber dikin. Pirraniya dibistanên tomarkirî heta niha pêşniyaza FSR'yê şopandiye.

Gelo te dil heye bizanî ka heger û sedemên FSR'yê di babetên cûr bi cûr da çî bûne? Li www.folkbildningsradet.se/fsr zêdetir bixwîne.

Têkilî bi me ra:

Rêveberê FSR'yê: 08-412 48 10

Folkbildningsrådets (switch): 08-412 48 00

fsr@folkbildningsradet.se